ÇÎROKÊN KLASÎK ÊN ZAROKAN

PRENSES Û POLIK

Hebû carek ji caran, xêr û xweşî bibarin li hazir û guhdaran.

Hebû tunebû, dibêjin li welatekî pir dûr prensek hebû. Vî prensî dixwest bi prensesekê re bizewice, lê belê bi prenseseke rastîn re. Ew, ji bo ku prenseseke rastîn bibîne, li her derê dinyayê geriya, lê mixabin wî nekarî li gorî dilê xwe yekê bibîne. Erê, gelek prenses hebûn, lê gelo ew bi rastî jî prensesên rastîn bûn?! Peydekirina prenseseke rastîn, ji bo prens gelek zehmet bû, çimkî wî di her prensesekê de kêmasiyek didît. Prens li gorî dilê xwe yek nedît û dawiyê ew bi awayekî pir xemgîn vegeriya mala xwe.

Rojekê, hewa pir xerab bû, li derve tofan radibû. Ji ber şîrqîniya birûskan û barana mîna lehî, mirov newêribû serê xwe derxista derve. Êvarê, yek hat li deriyê bajêr da û qralê kal çû bi xwe derî vekir.

Kesê li derî dida prensesek bû. Lê tu bidî xatirê xwedê, ev di bin wê baranê de, di wê hewaya ecêb de li çi digeriya! Ev çi halê wê bû! Feqîrê ji ber baranê ji serî heta pî şil bûbû, sol û cilên wê tev herimîbûn... Û wê ji qral û qralîçeyê re got ku ew prenseseke rastîn e!

Qralîçeya ixtiyar wê kêliyê ji keçikê re tiştek negot, lê di dilê xwe de got “em ê bibînin ka tu bi rastî jî prenseseke rastîn î an na!”. Îca qralîçe çû odeya razanê, nivîna ku keçik wê li ser razaya, rakir û polikek xist binê nivînê. Piştre jî bîst doşek li ser hev danîn ser wê û bîst betanî jî li ser hev raxistin ser wan. Diviyabû prenses wê şevê ha li ser wê nivîna qatqat razaya.

Serê sibê, ji prenses hat pirsîn gelo ew baş razaye an na. Prenses got:

--Ay, aay! Heta serê sibê, hema bêjin çavên min qet neçûn ser hev, ez hîç ranezam. Wekî ku tiştek hebû di bin nivîna min de. Îca ew tişt wisa hişk wisa hişk bû ku ji ber wê canê min hemû reş û şîn bûye! Ooy, her derê min diêşe!

Li ser van gotinên prensesê, qral, qralîçe û prens, her sêyan jî bawer kir ku ew keçik prenseseke rastîn e, çimkî wê ji ser bîst doşek û betaniyan hîs kiribû ku di binê nivîna wê de polikek heye. Û ancax canê prenseseke rastîn dikaribû ewqas nazik bûya.

Îca prens bi wê prensesa rastîn re bi kêfxweşî zewicî û ew polik jî di odeya xezîneyên hunerî de hat pêşandan. Ku kesî ew polik nebiribe, ew hê jî li wê odeyê ye.

Çîroka me qediya

Xêr û xweşî li hazir û guhdaran bariya.